keça kurd

# ZOZAN

Mahmut Baksi

Foto: Elin Clason



Institut kurde de Paris

Invandrarförlaget

OFFERT PAR JOYCE BLAU

liv. 7753


INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque
Reçu le 05/05/2021

Institut kurde de Paris



keça kurd

# ZOZAN



*Mahmut Baksi*

Foto: *Elin Clason*

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Invandrarförlaget
Kvarngatan 16
502 44 Borås
Keça Kurd ZOZAN
Utgavs första gången på
Rabén & Sjögren 1978 med titeln
Zozan – en kurdisk flicka
© Text: Mahmut Baksi, 1979
Foto: Elin Clason, 1978
Omslagsfoto: Ann Eriksson, 1978
Tryck: Ordfront, Stockholm 1979
ISBN 91-85242-28-4

# PÉŞGOTIN

Pêşiya wan zarokên ku bê zimanê diya xwe mezin dibin ne ronahî ye. Jiber vê yekê zarokên me divê bi Kurdî bixwînin û zimanê xwe pêşde bibin.

Sala çûyî ''ZAROKÊN IHSAN'' hate çapkirin. Îsal jî ''Keça Kurd ZOZAN.'' Daxwaza min ew e ku ev pirtokên tên çapkirin, belav bibin û bigêhin destên zarokên me. Ex dizanim, piraniya wan nikarin bi zimanê zikmakî binivîsin û bixwînin. Lê divê em alîkariya wan bikin. Azadbûna Kurdistanê bi zimanê me ve girêdayî ye. Wendabûna zimanê me, wendebûna me ye jî. Ji bo vê yekê dijminên me, zimanê me qedexe dikin. Divê em vê yekê ji bîra xwe nebin.

Televizyona Swêd sê proxram li ser ZOZAN çêkir. Û ê payîza tê bi swêdî, û kurdî nîşan bidin. Hersê proxram jî rengîn in. Hevalên dilsoz dikarin wan proxraman ji televizyona Swêd bixwazin, an jî li ser reya welatên din peyda bikin.

*Mahmut Baksi*
Gulan – 1979
Stockholm

Institut kurde de Paris

Ez vê pirtoka xwe ji Seydayê Mezin
Cigerxwîn re diyarî dikim
*Mahmut Baksi*

Institut kurde de Paris

# Keça Kurd ZOZAN

Navê min Zozan e.Ez li bajarê Stockholmê dijîm.Meha çûyî ez ketim sala sêzdan.Ez Kurd im.Em berê çar salan ji Kurdistana Bakur hatin vir.Gundê me, yê kevn nêzîkê Farqînê ye.Ez bi dilê xwe herdem li gund im. Gund û gundî ji hiş û serê min dernakevin. Dibêjin "bilbil xistine qefesa zêrînî,tim gotiye,ax welat." Tiştek wek welat xweş nîne.

Gundê me,gundekî piçûk e.Xaniyên me ji herrî û kelpiçin, banen me ji ax in.Bê xaniyê axê,xaniyên din du çavikin.Di çavikekê de em,ê din de pez û dewar dimînin.



Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris


Institut Kurde de Paris

Gava ku baran dibare banên me dilop dikin. Di vê demê de em tev, ji bo ku qulan bigrin, diçin ser banan û bangeraniyê dikin. Em zarok jî bi dest û peyên xwe banê direpinin û kayê direşînin. Ka tiştekî baş e, heriyê dide hev û nahêle zû bi zû qul çêbibin.

Em li gund pirr feqîr bûn. Gava ku baran dihat em şil dibun, dadê cilên me ji me dikir û dida ber tifikê. Wê gavê em an tazî diman, an jî em diketin nav ciyan. Wek hûn dizanin mirov bi cilên şil nexweş dibe. Li gundê me, her sal, ji tunebûnê, bi dehan zarok dimrin.

Li gundê me elektrik tune bû. Bi roj, roja Kurdistan em ronahî dikirin, bi şev jî hîva delal. Roj û hîv ên me tevan bû. Di van herdu tiştan de em û axê gund wekhev bûn. Axê, bi tenê roj û hîv bi me re par dikir, ew jî jiber ku tiştek ji destên wî nedihat. Nexwe ê ew jî ji me bistandana.

Me zarokan ji şevên hîvîn pirr hez dikir. Gava hîvê serê xwe di ber çiyayê Mereto de derdixist, gund dibû wek zîvê: Gund dibiriqî, çiyayên me gewr dibûn, çemên me diçilwilîn. Di wan şevên ronahî de em zarok ta nîvê şevê li derve diman. Dibû qîre qîra me. Me dilîst, baz dida, çavberdok digirt. Carna jî em radibûn govendê û me strana bûk û zavê digot. Yek ji me dibû bûk, yek jî dibû zava. Mezinên me bi me şa dibûn. Li ser banan guhên xwe didan ser me û dikeniyan. Wan dizanî ku gundên bê zarok nikarin bi dirêjî

Institut kurde de Paris

jiyana xwe dom bikin. Em mizgîniya domdariyê bûn, em nîşana hebûnê bûn.

Lê carna hîva me wenda dibû. Mezinên me digotin, hîv çûye gundên din ku zarokên wan gundan jî dilxweş bike. Wê gavê em û stêrkên me bi hevre diman. Ez ji stêrkan pirr hez dikim. Şevên çîksayî, bi stêrkên Kurdistan, şevên heja nin. Bi baweriya min, şevên derekê, şevên welatekî nagehîn şevên Kurdistanê. Bi milyonan stêrk xwe li ser gundê me kom dikin û ji me re çav dişkênin, dikenin, diçilwilin. Ronahiya wan ewqas ne gurr e, lê ronahiyekê nerm e, delal e, zelal e. Bi bîr û baweriya min mirovên ku li Kurdistanê şevên bi stêrk nedîtîbin, wan di jiyana xwe de gelek tişt wenda kirine.

Nemaze kêfa min ji koma sêwîyan re pirr dihat. Diya min çîroka wan ji min re gotibû.



Institut kurde de Paris

Çiroka "koma swîyan" gişt zarokên Kurdistanê dizanin. Jiber ku ew sêwîyên me nin, swîyên Kurdistanê nin. Divê em sêwîyên xwe ji bîr nebin.

Berê hezar salî li gundê me jin û mêrek jiyane. Ji wan re heft zarok çêbûne: çar kur û sê keç. Gundiya ji wan gelekî hez kirine. Ew jî wek me bi hîvê, bi rojê, bi stêrkan şa bûne. Şevên havînî û zivistanî derbaz kirine. Lê rojekê dê û bavê wan dimrin. Kesek li gund alîkariya wan nake. Zarok birçî dimînin, nexweş dibin. Paşê her heft bi hevre diçin serê çiyayê Mereto û ji Xwedê alikariyê dixwazin. Xwedê lavijên wan dihîne cih û her heftan li ezmên dike stêrk.

Çîrok çend rast e, ez nizanim. Lê tiştê ku ez dizanim, koma sêwîyan her dem li ser ezmanê gundê me ye. Mezinên me dibejin ku ev heft xwûşk û bira me nasdikin. Ji ber vê yekê dev ji me bernadin û naçin welatên din.

Diyên me, rojên înê, ji bo koma sêwîyan nan belav dikin û li hev dicivin.

Carna ku ez ji bavê xwe dêşim û gava diya min li min dêxe, ez ji Xwedê lava dikim ku bibim yek ji wan stêrkan. Lê dîsa diya min got, ew her heft naxwazin zêde bibin û gava dê û bav li zarokên xwe nexin û di dinê de zarokên birçî, reben û şerpeze nemînin, dê ew heft xwûşk û bira dîsa vegerin gundê me.

Di gundê me de avrêj tunebûn. Her kes diçû pişta malan û xwe rehet dikir. Me xwe bi keviran û bu axê paqij dikir. Ji bo vê yekê li gundê me pirr mêş hebûn. Mêşên pîs û bela diketin nav şîr û dewê me. Diya min ewna bi

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

kevçi û çoçikan kom dikir û davêt.Lê dîsa jî pisitîya wan dima. Salê bidehan zarok nexweş dibûn û dimrin.

Heya ez pênc salî bûm jî min nedizanî ez çawa hatime dinê.Kê,bi çî awayî ez anîbûm gundê me?Min pirr bîr lê dikir. Rojekê min ji diya xwe pirsî.Wê got: legê tu aniye vir.Bi rastî gotina diya min ketibû serê min.Ji bo vê yekê ez her roj diçûm ser banan û min li legan dinerî ka kîjan ji wan bû.Dibe ku wî ez nasdikirim,lê nedixwest di aliyê min de were.

Lê gava ku ez ketim sala şeşan,serê sibekê ez têgihiştim ku ne lege ez anîme gundê me.Serê sibê gava min çavên xwe vekir,nalîna diya min bû.Pîrka min Weso av germ dikir û li ber

çokên diya min runiştibû. Demek kurt derbaz bû,dıya min dilerizî,qîre qîra wê bû.Paşê min dît tiştek di nav lingên diya min de hate xwar û giriya.Wek pisikekê bû.Pîrka min Weso ew bi meqesê ji diya min birî û şuşt.Paşê xiste nav cilan û danî ser bêjinga ber serê diya min. Min bazda derve û mizgînî da bavê xwe.Bavê min pirr dilxweş bû û bi destê min girt,em bi hevre hatin ba diya min.Piştî bûyîna birayê min,hişê min tevlihev bû.Çava,bi çi awayî birayê min ketibû zikê diya min?Kê ew xistibû wir?Ez pirr dipûnijim.Ta ku rojekê Pîrika min Weso ji min re rastî got.Lê dîsa jî dudiliya min derbaz ne bû.

Çawa min got,xaniyê me du çavik bû.Em tev bi hevre di çavikekî de radizan.Lê min qet ne bihîst ku dadê û bavo tiştek kirin.Ew jî wek me radizan heya sibê.Em bêjin havînan,li nav titûnê hev diditin.Lê zivistanan?Di nav berfê de...

Min rojekê ji diya xwe pirs kir.Dadê ez dam ber qapqapkan û porê min kişand.Ji min re got:tu şerm û fihêt nakî.Zarok divê tiştên welê ji diyên xwe pirs nekin. Piştî wê lêdanê êdî min devê xwe venekir û li ser vî tiştî nesekinim.

Gava ku em li gund bûn,diya min her sibe ez şiyar dikirim.Nemaze sibên baharan,sibên germ û nerm,sibên delal,sibên xweş.Em tev li serbanan radiketin. Carna rojê em şiyar dikirin,carna jî baranê. Gava ku baran dihat,me lihêf dikişand ser serên xwe û gohên xwe dida ser dengê baranê. Dengek ji dengê barana biharê,li ser banan, Li Kurdistanê xweştir tune ye.Lê ez dîsa jî zû radibûm.Bo ku diya min bi tenê nedikarî pez bidota,meşk bikêlya.Xewna min di

Institut kurde de Paris

nîvî de dima.Min bi qloçên bizinan digirt, diya min jî ewna didotin. Piştî dotinê diya min şîr û şekir dida min. Şîrê bi şekir xuriniyekê xweş bû.

Piştê xwarinê diya min porê min şe dikir,biskên min dixemiland,kezîyên min çêdikir.Serên kezîyên min bi benikên sor,zer,kesk û sipî girê dida.

Gava ku şîrdotin diqediya,dewar û pez li meydana gund li hev diciviyan.Me zarokan,ji bo çêrandinê,ew dibirin Mêrge û çolê.Hinek ji me diketin pêşiya wan,hinek jî li paş diman.Çavên me



Institut kurde de Paris

herdem li ser pez û dewer bûn.Carna hevalên me li bilûrê dixistin. Ne me tenê,pez û dewarên me jî guhên xwe didan ser dengê bilûrê,dengê dilan û mexel dibûn.Paşê em ew ji bo avdanê radikir û dibir ber çem.

Ez ji baharên Kurdistanê pirr hez dikim.Di wê dema delal û dilgerm de bizin û mî dizên.Bi sedan berx û karik çê dibin.Gul,pivok û çîçekên Kurdistanê geş dibin,kûlîlk û nêrgiz mêrgan dixemilinin.Dilê xortan,dilê keçan dikevin hev.Barana biharê bîneke xweş ji erdê radike,çemên me pêl pêl dibin.Xuşîna xwe li çiyayên Kurdistanê dêxe û bi ser mêrgan ve derbaz dibe û diçe...

Em di wan rojan de,di wan rojên hêjmare de şivaniyê dikin.Diyên me her roj bi satilên xwe ve diçin bêrîyê. Bêrivanên me ref bi ref in.Keç,bûk û jinebî ji hev cuda nin.Di nav fîstanên xwe yên xemilî de stranan dibêjin, yariyan dikin û dikenin.

Piştê pezdotinê em tev bi hevre rûdinin û taştê dixwin.Xwarina ber bilûrê,çi dibe bila bibe,xwarineke pirr xweş e.

Paşê em berx û miyan karik û bizinan tevlehev dikin.Hemû ên xwe dinasin.Berx û karik devên xwe davêjin çiçikên diyên xwe û dûvên xwe dihejînin, piyên xwe ên paşin li erdê dexin.Ta ku têr nebin naxwazin ku ji çiçikên diyên xwe biqetin.Piştî şîrdanê em zarok,ta ku şivan pez dûr dikin,wana bi gopalan diqefilînin û li ber wan nobet digrin.

Bê guman rojên me her dem ne wek hev in. Carna rojên tarî,rojên bi xem jî em derbaz dikin.Tiştên nexweş û dilêş jî çê dibin.

Institut kurde de Paris

Nemaze rojên zivistanê ku gur tên pezên me. Gurên har û birçî,gurên çiyayên Kurdistanê:Di van deman de em pirr dikşînin.Bi gopalan,bi keviran em êrişî ser guran dikin.Lê pirr caran em bi guran nikarin.Bo ku gur bi tenê nayên.Qefle bi qefle didin pey hev û dirêjî ser pez dikin. Hinek ji wan me ditirsinin,hinek nobet digrin û ên din jî çend mî û bizinan davêjin erdê û perçe dikin. Lê em zarok newêrin ber gund bazdin.Gur ne tenê pez dixwin,dikarin zarokan jî perçe perçe bikin.

Piştî çûyîna guran em berx û karên xwe dijmêrin.Ka ên kê kêm in,ka guran ên kê xwarine.Lê ji girînê bêtir tiştek ji destên me nedihat.Em stoxar diçûn gund.Xortên gundê me ji bo tolstandina berx û karan didan tifingên xwe û bi çolan diketin.

Şerê me û guran şerê hezar salî ye.Ev şerê han ta îro dom dike û ê bike jî.Ez wisa bawer im ku emê rojekê guran ji Kurdistanê bavêjin. Wê gavê êdî ê pez û dewarên Kurdistanê li



Institut kurde de Paris

ser mêrgan bê tirs biçêrin û mexel bibin.

Berî ku ez hatim Stockholmê berxeke min hebû, min navê wê danibû Delalê. Berxeke sipî, enî beş bû. Sipîbûna hiriya wê li berxekê tune bû. Hiriyê wê guzwan guzwan bû. Gava em diçûn çolê qet ji min nediqetiya. Carna baz dida, carna radibû ser peyên xweyên pêşîn û teqle davêt. Gava diwestiya dihat li ser çokên min rûdiniştt. Bi zimanê xwe dev û lêvên min dadilêst, ez bîn dikirim. Carna jî min xwê didayê. Delalê bi kêf û nazî kefa destê min dadilêst ta destê min sor dibû.

Roj bi roj, meh bi meh Delalê mezin dibû. Lê mezinbûna Delalê nedihat ber çavên min. Min digot ka Delalê ê tim weke xwe bimine. Lê sibekê ji siban Delalê hate ba min. Berxeke delalok pêra bû. Wê gavê min fam kir ku Delalê êdî ne berx e, Delalê bûye dê. Ez berve wê çûm ku xwê bidimê. Delalê vê carê xwê ji destê min nexwar, li nav çavên min mêze kir û para para çu.

Bi rastî dilê min ji Delalê neşikest. Jiber ku ez dizanim, hezkirin mafê diyane. Dil dil e. Pez jî wek me bi dil in. Ew jî carna şa dibin, carna digrîn, carna nexweş dibin.

Rojekê, di rojekê tarî de guran berxê Delalê xwarin. Delalê piştî berxa xwe dîn bû, bi çolan ket. Carna dihat ba min û li nav çavên min mêze dikir; bi çavên şikestî, bi çavên xemgir. Delalê ji min alikarî dixwest. Bi kêmanî ez jî wek wê dêşiyam, dilê min diperitî. Lê tiştek ji destê min nedihat. Ez jî wek Delalê bê çare bûm. Delalê roj bi roj qels ket, ronahîya çavên wê kêm bûn.

Bavê min hevalê peze. Şivanek wek bavê min pez

Institut kurde de Paris

başnasnake.Emrê bavo bi wan re derbaz bû ye. Hinek dibêjin,bavê min bi zimanê pez dizane û bi wan re dipeyive. Baweriya min jî ewe.

Rojekê bavo çû gundekê din û berxek kiri,hate mal.Diya wê berxê jî guran xwari bû.Piştê nivro ser mêrgê pez mexel bûn.Delalê dîsa qîre qîr dikir û diçû û dihat.Bavê min çû ba Delalê,berx danî ber.Lê Delalê ew nexwest,jê reviya.Berxê da pê.



Institut kurde de Paris

Delalê lê mêze nekir. Berxa birçî ji nedîva bi çiçikên Delalê girt û mijî.Delalê pêra pêra sist bû,gavên wê vebûn. Serê xwe bi alî dûvê berxikê de bir,bîn kir. Ev bîn ne bîna berxa wê bû.Lê Delalê ji halê fam kir.Piştê demekê berx û Delalê ji hevra bûn dê û zaro.

Piştê vê bûyerê ez pirr dilxweş bûm.Ez dizanim,bihara bê Delalê ê berxekê din bizê.Lê ew tucaran kula berxa xwe ji bir nake û her dem ê neyarê guran be.

Li gund ne gur tenê bela serên me bûn.Mar jî pirr bûn.Marên reş,marên gewr û deq deqî.Carna dibû vîze vîza wan û didan pê me.Hinek ji wan wek werisan dirêj bûn, hinek ji wan zikwerimî bûn.Nemaze ên zik gewr gelek dijwar bûn.Mirovan ewna pêra pêra dikuştin. Carna em li ser mêrgan rudiniştin û me xwarin dixwar; marên di nav giyan de veşartî xwe nêzîkî me dikirin. Wê gavê dibû xûşe xûşa giyayê,giya xaroviçko dibû.Kuçikên me direyîn û em siyar dikirin. kuçikan newêrîbûn bi ser wan de biçin.Lê em hewqas ne tirsonek bûn. Me dida gopalên xwe û êrişî ser wan dikir.

Rojekê em zarok li ser mêrge rûniştibûn.Pez,ji germê mexel bûbû.Roj di ezmên de çikiyayê bû. Germek ji germa tebaxê em dişewitandin.Germeke



Institut kurde de Paris

zerî,germeke tûj.Em deh heval bûn,şeş kur û çar keç.Min dît,ji nedive, Welat ji ciyê xwe pekiya û bi qorika xwe girt, qîjînî jê hat.Marekê reşbelek pê ve veda bû û direvi ya.Me mar da ber gopalan,ber keviran. Me di bîstekê de ew perçiqand.Xûşka min Sêvê di alî mî yan de bazda û şûnde zivirî. Devê wê tijî şîr bû. Sêvê devê xwe xist qorika Welat û mijî, Xwîna Welat ji jehrê paqij kir.Welat di nav çend rojan de baş bû û dîsa bi me re hat ber pez.

Em zivistanan dewarên xwe bernadin çolê.Wan di axuran de êm dikin.Axur û xaniyên me di nav hevda nin.Bi şev gava tarî dibe,gava diya min çira ditefîne çavên pez û dewaran wek stêrkan diçirisin.Min her şev li wan çavên gewr û belek dinerî û xew ve diçûm.

Institut kurde de Paris



# Rojekê bavo wenda bû

Beriya çar salan rojekê bavê min wenda bû.Bi mehan,bi salan me ew nedît.Cîranên me gotin guran bavê me xwari ye. Hinekan jî gotin bavê me bûye mahkûm û çuye serê çiyayên Kurdistanê.Jibo ku leşkerên Tirkan tadeyî didan Kurdan,li wan zilim dikirin,bi hezaran Kurd xwe didin çiyan û li hemberên van faşistan şer dikin.Dibe ku bavê min jî bûye yek ji wan mahkûman.Bavê min ji zilmê,ji koletiyê hez nedikir.

Hinekan jî gotin,bavê me çûye gundekî din û li wir zewiciye,zarokên wî çêbûne,û êdî naxwaze were me bibîne.

Em çar zarok bûn.Dilê ciranan,dilê zarokên gund bi me dişewitî. Ciranan bi çavekê sêwîyan li me dinêrin.Cilên xwe yên kevn û xarin didan me.

Rojekê Ape min Kendal hate mala me û ji diya min re got,divê em pez û dewarên xwe bifroşin.Firotina pez û dewaran bitenê sê roj girt.Dadê tiştên me yên kevn,firaq, ceran li ciranên xwe bela kir.Me zarokan tiştek ji wê rewşê fam nedikir. Dadê jî ji me re tiştek nedigot.Gava me jê pirs dikir,digot emê jivî gundî·biçin,hewqas.Dadê pirr hêrs bûbû,di hindurê xwe de digiriya,çavên wê sor bûbûn.Firotina pez bûbû pizot di dilê wê de. Duman ji devê wê derdiket.

Ez wê gavê yanzde salî bûm.

Apê min Kendal û em çûn ber otebosê.Gava otebos bi rê ket,ne em tenê,gundî jî digiriyan. Ev cara yekemîn bû ku em diketin otebosê.Em çûn, rê dawî nedihat.Dilê diya min digeriya,nava wê li hev diket û dive-

Institut kurde de Paris

reşiya.Rûyê wê zer bûbû, ji hal ketî bû.Carna em diçûn serên çiyan,serên me li ezmên diket,rojê em dişewitandin.Hasilî reveçûnekê metirsî bû. Lê dîsa jî min qima xwe bi rewşa xwe tanî. Min nedixwest dawiya rê were.

Piştê şev û rojekê em hatin gundekî mezin û ji otebosê peya bûn.Apê min got navê vê gundê Enqere ye.Gund pirr qelebalix bû.Me nikarî bû tê de bi serbestî bigerin.Xelq li hev diket.Bi hezaran tamefil û otebos diçûn dihatin.Ji dengê wan em dîn dibûn.Gava min li temefilan dinerî gund û pezên me dihatin bîra min.Wan jî wek pez dabûn pey hev û diheri-kin,diçûn.

Mirovên vê gundî ne wek mirovên gundê me bûn.Ne bi rûçik,ne jî bi cilên xwe wek me bûn. Min mirovên wilo ecêp nû didît.Nemaze jinên wan.Şarpe,an jî laçik li ser serên wan tune bûn.Porên wan difiriyan, ber bayê tevlehev dibû. Piraniya wan bi şal bûn û milên wan tazî bûn. Lêvên wan sorkiri,çavên wan kildayî bûn.Lê min bi wan re zarok nedît. Piraniya jinan erebên piçûk dajotin.Apê min Kendal got ku zarokên wan di nav erebokan de nin.Jibo ku gund pirr qelebalix e,zarok nikarin li ser rê bigerin.
Tamefîl û mirovên mezin dikarin pêl wan kir.Min ji wan erebên piçûk pirr hez kir.Min dixwest yekî ji wan bajom.Apê min nehişt.Apê min got diya wan nahêlin û dikarin giliyê me li ba polisên Tirk bikin. Li vir kes me nasnake.Em biyarî ne, em Kurd in.Ev gund gundê Tirkan e,ji bîr mebe.

Roja me zû derbaz bû. Ji nedîve roj werda bû, wek perdekê tarîtî ket ser gund.Piştê bîsteke gund dîsa wek nûr beriqî.

Institut kurde de Paris

Ronahike bê germ çavên me êşand.Apê min got li vî gundî stêrk li ser daran daleqandine.Bi milyonan stêrk li ser darên çikandî,dirav gund de di çilvilîn.

Bi rastî,stêrkên vir ne wek ê gundê me delal bûn.Gund bê hîv bû, ezman xûya nedikir.Roj û şev bûbûn wek hev.Ez jibo zarokên vê gundî pirr dêşiyam. Zarokbûna wan bê çavberdok,bê govend derbaz dibû.Ez di ciyê wan de bûma ta zarokbuna min biqediya ezê biçûma gundên Kurdistanê.

Em wê şevê li Enqerê razan.Roja din,serê sibê piştî nîvro em çûn ber meydaneke mezin.Li meydanê tiştên entîke hebûn.Çivikên hêsinî,bi perrên mezin xwe mexel kiri bûn.Qîjîniya wan diçû ba hîvê.Guma guma wan bû,yek difiriya,ê din vedinişt.Temaşekê hêja bû.Dem pirr zû derbaz dibû.Paşe em ketin zikê yeki ji wan.

Apê min Kendal ne bi me re bû.Tirseke dijwar ketibû nav dilê me.Û me nedizanî ka ê di nav çivika hêsinî de çi bihata serê me.Bi sedan mirov hebûn.Lê bê me kes nedigirî.Keçikeke lêvsor, por vekirî em bi qayişan girêdan.Û ji nişkave em firiyan.Gohên min werimî, dilê min li hev ket, verişandina min dihat.Em li ser Enqere re difiriyan.Bi milyonan stêrk dibin me de hebûn.Hindik mabû dîn bibûma.Tucaran nehatîbû bîra min ku ezê rojekê li ser stêrkan bifirim.Paşê Stêrken Enqerê hêdî hêdî wenda bûn.Dinya şevtarî bû,di kulekên piçûk de tiştek xuya nedikir.Em ketibûn nav şevekê tarî; bi dilekî şikestî,bi dilekî birîndar.Tirsê xewa me zû anî.Me xwarina wan nexwar.

Ez nizanim em çiqas firiyan.Gava ku me çavên xwe vekir em dîsa li erdê bûn.Xelq ji çivîka hêsinî derdiket.Me jî da pey wan.

Institut kurde de Paris

Em derketin holeke mezin û dirêj.Min dît bavê min dikene û berve me tê. Cilên wî nû bûn.Bavo hinek qelew bûbû,rengê wî guhêrî bû.Em tev li holê rûniştin û giriyan. Bavo diya min hembêz kir û destê xwe avêt pişta wê.Ev cara yekan bû ku bavo ber çavên me dadê maçî dikir.Lê diya min ji hal keti bû,reng lê nema bû.Dikir nedikir stêrkên çavên wê nedisekinin.

Em nîvê şevê hatin Stockholmê,gundê me ê nû.Li vî gindî jî stêrk bi daran ve daliqandî bûn.Xaniyên gund wek sûra Diyarbekirê dirêj bûn.Tu xaniyên kerpiç, banên bi ax neketin ber çavên min.Pirên betonî gund bi hev re girêdabûn. Li ser reya,bin daran pez û dewar tune bûn.Car caran hinek kûçik ber çav diketin.Lê bê deng û bê reyîn.Min kûçikên ewqas sernerm hêj nedîtîbû.

Wê şevê em dereng razan û zû şîyar bûn.Roja pêşî bavo nehişt em derên derve.Min di penceran re li gund dinêrî.Xanî pirr bilind bû,serê min gêj dibû.Min dida ser hev, ka ezê bi çi tewrî,bi çi awayî biçim jêr.Min rêyek nedidit.

Dotira rojê ez têgiştim. Bavo em tev xistin qutîke hesinî û birin jêr,çûn nav gund.Di heftekê de min gund baş naskir.Edî ez bi serê xwe bê tirs diçûm dihatim.Lê mesela zimên me perîşan kiribû. Li vî gundî kesekî bi Kurdî nedizanî.Carna min dikir ku bi wan re bipeyivim,lê çênedibû. Li çavên min mêze dikirin dikeniyan û dûr diketin. Em gişt kehr û lal bibûn.Bê lîstin,bê çirok, bê xeberdan rojên me derbaz dibûn.Em wek dîna diçûn nav gund digeriyan. Tu zarokekî bi me re nedilîst û bi alîyê me de nedihatin.

Payîzê me dest bi dibistanê kir.Di sinifa me de zarokên porzer hebûn.Bi çavekê nebaş

li me dinêrîn.Carna mamoste ji min tiştan pirs dikir,min ji şerma serê xwe dixist ber xwe û li neynûkên xwe dinêrî.

Lê ez zû hînê zimanê Swêdî bûm.Dinya min hate guhartin.Lal û kehr bûna min wenda bû.Rengê min vebû,kêfa min hate cî. Bi dehan hevalên minê porzer çêbûn.Me heroj bi hevredilîst,em dikenin,me yarî dikir û em diçûn malên hev.

Hevalekê min he ye navê wê Mariya ye.Em her du jî sêzde sali ne.



Institut kurde de Paris



Porê wê zer e,ê min reş e.Çavên wê şîn in, ê min reş in.Ew Swêdî ye,ez Kurd im.Lê dîsa jî em ji hev pirr hez dikin.Mariya carna min dibe malê.Bi sedan tiştên Mariya hene.Diya wê jêre her tişt kiriye. Oda wê xemilandiye.Gava ku ez û Mariya li mal in diya Mariya hergav xwarin û vexwarin dide me.Carna jî jibo sinemayê pera dide me.

Mariya keçekê ciwan e û pirr bê kêf e.Lê carna gunehê min pê tê. Jibo ku dê û bavê Mariya hev berdane.Bavê Mariya li bajarakê din dijî û Mariya qet nabîne.Jibo vê yekê gava diya wê kar dike ew pirr caran tenê dimîne.Mariya,ji tenêbûnê pirr aciz e, lê tiştek ji destê wê rebenê nayê.

Lê ez qet tenê naminim.Mala me herdem tijî ye.Zarokên me gelek in.Dost û pismamên me hergav tên

Institut kurde de Paris

mala me.Hasilî tenebûn ji me dûr e û nikare di alî mala me de derbaz bibe.Em Kurd ji tenêbûnê hez nakin.

Meha çûyî keçek ji diya min re çêbû.Me nevê wê kir Brûskê.Ez bi hatina Brûskê pirr dilxweş bûm.Gava ku ez Brûskê didim ser milên xwe û bîn dikim,Delalê tê bîra min.Delala çavreş,enîbeş.Kezaba min dişewite,Kurdistan tê ber çavên min.Qirika min tijî dibe,stêrk ji çavên min tê.Lê ez bi dilê xwe bawerim,ezê rojekê biçim Kurdistanê.Kurdistaneke serbilind,ava û azadkirî.

Bê guman Stockholm jî pirr xweş e û gundekî geş e.Li vir her tiştên me hene.Ji televizyona rengîn bigre,heta makina cilşuştinê.

Xaniyê me modern e,hatina me li ci ye.Deynê me tuneye.Em hergav ziktêr in,cil paqij in.Kes wek hikumeta Tirkan tadeyî li me nake. Li dibistanên vir em bê tirs,bê lêdan bi zimanê xwe dixwînin.Mamosteyên me Kurd in.Bi kurtî,zorkeriya dibistanên Tirkan li vir tuneye.Lê dîsa jî Kurdistan herdem di dilê me de ye.Welêt şirîn e, Welêt delal e.Bê welatê xwe mirov her tim sêwî ye,stoxar e,reben e.

Jibo vê yekê divê em welatê xwe azad bikin.Bê azadbûna Kurdistanê em nagihên mirad û armancên xwe.

Baweriya min ew e ku emê Kurdistanê azad bikin. Kurdistan bê me,em bê Kurdistanê nabin.Keç û xortên me ji bo şerê AZADÎ ji vê gave xwe dane hev...

Institut kurde de Paris

# Kurdîstana Kurdan

Navê min Elin Clason e. Ez rojnamevaneka Swêdî me. Havîna çuyî ez nêzîkê mehekê li Kurdistana Tirkiyê geriyam.Ez çûm gundê Zozanê û li koma şêwîya nerim,li serbana razam.Serê siban berx û miya ez şiyar dikirin.

Gundê Zozan jî wek gundên Kurdistanê pirr neçar û xirabe bû.Hikumeta Tirkan alîkari ya wan nedikir.Kurdistan jibo Enqerê wek kolonî bû. Enqere bi leşkerên xwe Kurdistan vegirtiye û roj bi roj Kurdistanê talan dike.Talankirineke eşkere,vekirî,ber çavan.

Berî ku ezê biçim Kurdistanê,min pirr tiştên nexweş li ser wî welatî seh kiri bûn.Pirr caran min bawer nedikir. Ji min ku Kurd bi zaneyî li dijî Tirkiyê dipeyivin. Lê niha ez tê digêhim. Tirkiye bi awekî bê mirovtî Kurdistanê diperçîqîne û dixwaze Kurdan ji cihanê rake.

Li Enqerê gava min mesela Kurdan ji wezirê hindurî re vekir;çavên wî pêra pêra mezin bûn. Hindik ma bû min bigrin. Ev tişt ne bi dilê wî bû. Ji min re got,mirovên li Tirkiyê herkes Tirk e.Bi mesela Kurdan ên mijûl dibin dijminên Tirkan in,bi baweriya wezîr.Divê mirovên wusa peyên xwe navêjin Tirkiyê.Polisên Tirkan herdem li pey wan in û wana nasdikin.

Wezîr derew dikir.Dibe ku ji bona wezîr Kurd tunene.Lê min bi çavên xwe,bi mîlyonan Kurd,li Kurdistanê dît.Çavên min, min naxapînin.Ji Sêwasê bigre heya Erzeromê newal û çiya tijî Kurd bûn.Ne zimanê wan,ne adet û çanda wan wek ê



Institut kurde de Paris

Tirkan bû.Ferqa di nav zimanê Kurdî û Tirkî de wek ê Erebî û Swêdî bû.

Wezîrê Tirkan herhal em biyanî cahîl didit.Bi wî ku em jî wek wî kor û nezan in.Halbukî em li Swêd di dibistanên xwe de li ser dîroka Kurdan ders dibînin.Em baş dizanin,Kurdistan kînga û çawa,bi çi awayî hatiye perçe kirin.Tiştên dirokî zû bi zû wenda nabin.

Li Kurdistan min bi hezaran zarokên nexweş, birçî,zikwerimî dît. Piraniya wan nediçûn dibistanan.Dibistanên Kurdî tunebûn.Mamosteyên Tirkan bi daran,bi şimaqan,bi zordestî dixwestin wan bikin Tirk.


Gava ez li Gundê Zozan bûm,car caran cendermên Tirkan dihatin gund.Pirr tadeyî li gundiyan dikirin.Min ji tirsa nedikarî dengê xwe derxista.Ez bi dizî çûbûm Kurdistanê.Çawa hûn dizanin,rojnamevanên biyanî bê rêdan nikarin biçin Kurdistanê. Rêdan sitandin jî pirr dijwar e,bê imkan e.

Kurdistan di şerê yekemîn de hate perçe kirin.Tirkiye,Iran,Irak û Suriye Kurdistan di nav xwe de par kirine û dixwazin Kurdan ji cihanê rakin.Ev her çar dewletên faşist û kolonyalîst tim li Kurdan dêxin û nahêlin Kurd serên xwe bilind bikin.Carna Kurd û ev Welatên faşist şer dikin,bi hezaran Kurd tên kuştin.Lê bi kuştinê Kurd naqedin.Iro li Kurdistanê bîst milyon Kurd dijîn.

Jibo welatên kevneperest û kolonyalîst Kurdistan ne giring e.A giring petrola Kurdistanê ye.Bihayê petrolê ji jiyana Kurdan,ji hebûna Kurdan girantir e.Edalet û demoqrasî di nav petrolê de wek qetran, wek zift reş bûne.

Li Kurdistanê dewlemend jî hene.piraniya wan xwe

Institut kurde de Paris




firotine dijminên Kurdan. Bi dijminên Kurdan re bûne yek û Kurdistanê talan dikin. Bi dewlemendên Tirkan ve hatine giredan û zincîra



Institut kurde de Paris



koletîyê xistine stoyê xwe.

Kurdistan îro bindest e.Lê bi bîr û baweriya min,di demeke nêzîk de ê cihan bi dengê Kurdistanê bihêze.Pêlên Kurdistanê ên bingolî hêj derneketine ser avê.Pêlên kûr û gurr, pêlên dîrokî,roj bi roj bilind dibin.Bi sedhezaran xort û keçên Kurd şiyar dibin,xwe kom dikin, jibo roja azadî,roja serxwebûnê.Ew welatên ku Kurdistan vegirtine,serê xwe xistine belake mezin. Bi zînat û zordarî mirov pêş ve naçe.

Bi kurtî,di meha ez li Kurdistanê mam,min gelek tişt dît û ez bi dilekî germ ,bi dilekî şoreşgerî zivirim.Dexwaza min ew e ku Kurd jî wek gelên cihanê,wek gelên bindest azad bibin, Kurdistanê ava bikin. Zarokên Kurd bê tirs, ziktêr biçin dibistanên xwe û Kurdistanê peş ve bibin.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

This is the Kurdish edition of "Zozan, a kurdish girl", which was published in Swedish in 1978. The author Mahmut Baksi comes from Kurdistan. He has lived in Sweden since 1971. He has also written the book "The Children of Ihsan", which was published in kurdish in 1978. The photos were taken by the swedish journalist Elin Clason on her trip to Kurdistan in 1977.

Ez ji biharên Kurdistanê pirr hez dikim. Di wê dema delal û dilgerm de bizin û mî dizên. Bi sedan berx û karik çê dibin. Gul, pivok û çîçekên Kurdistanê geş dibin, kûlîlk û nêrgiz mêrgan dixemilinin. Dilê xortan, dilê keçan dikevin hev. Barana biharê bînekê xweş ji erdê radike, çemên me pêl pêl dibin. Xuşîna xwe li çiyayên Kurdistanê dêxe û bi ser mêrgan ve derbaz dibe û diçe...

Em di wan rojan de, di wan rojên hêjmare de şivaniyê dikin. Diyên me her roj bi satilên xwe ve diçin bêrîyê.

Bêrivanên me ref bi ref in. Keç, bûk û jinebî ji hev cuda nin. Di nav fîstanên xwe yên xemilî de stranan dibêjin, yariyan dikin û dikenin.

Institut kurde de Paris

Invandrarförlaget

ISBN 91-85242-28-4

Institut Kurde de Paris
IKPLIV107753